# BERNAMEYA RÊZIMAN

**Amadekar :Egîd Cîlo**

**Dîroka Çapê: Sibat 2009**

**Cihê Çapê: Çapxaneya Azadî**

**Weşanên Komîteya Ziman û Perwerdeya Kurdî**

**WANEYA-1**

**RÊZIMAN**:Rêz û rêçikên ziman nîşanî mirov dide.
**DENG**:Bayê ku ji cegera mirov derdikeve,diçe zengilorê, li vir bizavakê dide tayên deng; ew deng bi alîkariya qirik, lêv, diran, ziman, ezmanê dêv û difin dirûvekî digire; ji vê re deng tê gotin.

**DENGDÊR(BIDENG)**:Ji dengên ku rasterast ji devê mirov derdikevin re **dengdêr** tê gotin.
**DENGDAR(BÊDENG):**Ji dengên ku nikarin bi serê xwe ji devê mirov derdikevin re **dengdar** tê gotin. Ji bo ku mirov karibe wan bi lêv bike pêwîstî bi dengekî dengdêr heye.

**ALFABEYA KURDÎ**

**TÎP**:Deng bi alîkariya hin nîşaneyan tê nimandin ji wan nîşaneyan re **tîp** tê gotin. Di alfabeya Kurdî de 31 tîp hene.

**1-TÎPÊN GIRDEK(MEZIN**):
**A-B-C-Ç-D-E-Ê-F-G-H-I-Î-J-K-L-M-N-O-P-Q-R-S-Ş-T-U-Û-V-W-X-Y-Z**

**2-TÎPÊN HURDEK(BIÇÛK):**
**a-b-c-ç-d-e-ê-f-g-h-i-î-j-k-l-m-n-o-p-q-r-s-ş-t-u-û-v-w-x-y-z**

**3-TÎPÊN DENGDÊR(8**) **:a-e-ê-i-î-o-u- û**
**a-Dengdêrên dirêj(5) :a-ê-î-o- û**
**b-Dengdêrên kin(3) :e-i-u**
**c-Dengdêrên rast(5) :a-i-î-e-ê**
**d-Dengdêrên girover(3) :o-u-û**

**4-T ÎPÊN DENGDAR(23):b-c-ç-d-f-g-h-j-k-l-m-n-p-q-r-s-ş-t-v-w-x-y-z**

**Hîndekarî**

**Bersivên pirsên jêr bide**

**1-Rêziman çi ye? Deng çi ye?**

**2-Tîp çi ye?Tîpên Kurdî çendin? Tîpên Kurdî yên girdek û hûrdek li gorî rêzan wan binivîse**
**3-Dengdêr çi ye?Tîpên dengdêr ,dengdêrên dirêj û dengdêrên kin binivîs e.**
**4 Dengdar çi ye?Tîpên dengdar li gorî rêza wan binivîse**
**5-Li jêr kîjan tîpên hûrdek û li gorî rêza xwe hatiye nivîsandin?**
**A)** A-B-C-Ç-D-E-Ê-F-G-H-I-Î-J-K-L-M-N-O-P-Q-R-S-Ş-T-U-Û-V-W-X-Y-Z
**B)** a-b-c-ç-d-e-ê-f-g-h-i-î-j-k-l-m-n-o-p-q-r-s-ş-t-u-û-v-w-x-y-z
**C)** A-B-C-Ç-D-Ê-E-F-G-H-I-Î-J-K-L-M-N-O-P-Q-R-S-Ş-T-Û-U-V-W-X-Y-Z
**D)** a-b-c-ç-d-e-î-i-j-k-l-m-n-o-p-q-r-s-ş-t-û-u-v-w-x-y-z
**6-Ji tîpên jêr kîjan dengdêr in?**
A)gbcghjk B)sdfghjkl C)aeêiîouû D)bgfdkmn
**7-Ji tîpên jêr kîjan dengdar in?**
A)sdfghjkl B)aeîo C)eiu D)aêîoû
**8- Tîpên Kurdî çend in, dengdêr çend in û dengdar çend in?**
A) Tîpên Kurdî 33, dengdêr 8 dengdar 23
B) Tîpên Kurdî 31, dengdêr 8 dengdar 23
C) Tîpên Kurdî 31, dengdêr 23 dengdar 8
D) Tîpên Kurdî 34, dengdêr 8 dengdar
**9-Tîpên kurdî ên dengdêr li gor beşên wan binivîse.**
**10-Di hevoka jêr de tîpên dengdêr û dengdar kîjanin binivîse.**
Parêzer mafê mirovan diparêzin.

## WANEYA-2
## PEVDENG (DUÇENG)

**Pênase**:Dema tîpa « X » û tîpa « W » tên rex hev pevdenga Kumanciya jorîn « XW » sazdibe. Ji tîpên(a-e-ê-î) pevdeng çêdibin; ji tîpên (i-o-u-û) pevdeng çenabin.

Xwa Xwe Xwê Xwî

Mînak:
Xwa:xwar   xwarin
Xwe:xweda  xwendevan
Xwê:xwê  xwêdan
Xwî:xwîn  xwîşk
(xwi,xwo,xwu,xwû)  çewtin, lê belê "xwi" weke "xu" jî tê bikaranîn.

## Hîndekarî

**Bersivên pirsên jêr bide**

**1-Pevdeng çi ye?**
**2-Pevdeng bi kîjan tîpên dengdêr sazdibe?**
**3-Ji peyvên jêr kîjan rast hatiye nivîsandin?**
A)xendevan     B)xemgîn          C)xaringeh          D)xîn
**4-Li jêr kîjan pevdeng e?**
A)xwo        B)xwu            C)xwû                D)xwe
**5-Pevdenga kurdî binivîs e. Li gorî tîpên dengdêr ku têne rex wê ji her yekê Mînakekî bide.**

## WANEYA-3

Destpêkê hevpeyvîna li jêr baş bixwîne û bala xwe bide peyvên reşkirî.

**Viyan:**Rojbaş **Jiyan**.
**Jiyan:**Rojbaş **Viyan**
**Viyan:**Baş e, ka ez **deriyê** malê bigirim.
**Jiyan:**:Çi bi **tiliyên** te **hatiye**?
**Viyan:** Di ber **deriyê** malê de ma?
**Jiyan:** **Ew kî ye** li gel te?
**Viyan:** Hevaleke min e.

***RÊZIMAN***: Berî tîpa “**Y**” tîpa “**Î**” nayê, dema bê jî bi tîpa “**I**” tê guhartin. Ji ber ku tîpa “**Y**” nîv-dengdêr e, tîpa “**I**” dirêj dike. Ji ber vê jî di xwendinê de weke tîpa “**Î**” tê xwendin.

***Mînak:***

| **Xwendin** | **Nivîsandin** |
|---|---|
| Jîyan | Jiyan |
| Vîyan | Viyan |
| Derîyê malê | deriyê malê |
| Tilîyê te | tiliyê te |
| Hatîye | hatiye |

***Têbinî***:Dema ku ji hev cûda bin wek xwe dimîne.
Ew kî ye?

**Hîndekarî**

**Bersivên pirsên jêr bide**

**1-** “**I**” berî “**Y**” çima weke ku “**Î**” heye tê xwendin?

**2-Ji peyvên jêr ên rast û şaş hatiye nivîsandin ji hev cûda bike.**

Ketîye, bajarî ye, bihêvî ye, xwariye, deriziye, gundiye,

## WANEYA-4
## TÎPÊN CÊWÎ

**Pênase**:Hin tîpên dengdar hene du dengan(hişk û nerm) derdixin.Ji wan tîpan re **tîpên cêwî** tê gotin.
Tîpên cêwî evin: **Ç-K-P-R-T**
Minak:

| **Tîp** | **Peyv** | **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|---|---|
| Ç | çilo | Pelên daran | Çawa |
| | çal | Bîra avê | Hespê çal |
| | çar | Çarşef | Hejmar |
| K | ker | Kesên nabihîze | Lawirek baran |
| | kal | Mêrê pîr | Zebeşê çênebûye |
| | ka | Êmê lawiran | Daçeka pirsê |
| | kanî | Avzem | Li ku ye? |
| | kar | Çêlîkê bizinan | Şixûl |

| | | | |
|---|---|---|---|
| P | pîr | Kesên kal | Mezinên elewî û Êzidiyan |
| | par | Sala derbasbûyî | Parêkirin |
| R | vir | Vê derê | Derew |
| | wir | Wê derê | Çawê şaş |
| T | ta | Dezî | Nexweşî |
| | terk | qeyş | Dev jê berdan |

**Hîndekarî**

**Bersivên pirsên jêr bide**

**1-Pênaseya tîpên cêwî bide.**
**2-Ji bo her tîpeke cêwî Mînakekê bide.**
**3-Ji peyvên jêr ên hişk û nerm ji hev cûda bike.**
Çem, derî, kevir, kelê, pêngav, tenê, çar

## WANEYA-5
## TÎPÊN KELIJANDINÊ (SIWAR)

**Pênase:**Di Kurmanciya jorîn de du dengdêr li pey hev nayên . Dema ku li pey hev tên jî, wê demê tîpeke kelijandinê dikeve navbera wan. Sê dengên ku bi peywirê radibin hene:**H-W-Y** Ev her sê deng wekî **nîv-dengdêr** jî têne binavkirin.
Mînak:**H**: ava**h**î,rona**h**î, şîna**h**î, perwerde**h**î
**W:** ri**w**ê min, xwesi**w**a te
**Y**:rû**y**ê min, xweza**y**î, bi vî awa**y**î, pi**y**ê min
**Têbînî(1):**Dema hinek peyv bi dengdêr destpêbikin ev rêpîvan di hin rawe û deman de binpê dibin.
**Mînak:**Înan:biîne=bîne(raweya fermanî)
Êşîn:diêşîne=dêşîne=têşîne(dema niha)
Ewr:biewr(wek rengdêr)
Aqil:biaqil=baqil
Avêtin:diavêje=davêje=tavêje(dema niha)
Ajotin:biajo=bajo(raweya fermanî erenî)

**Hîndekarî**

**1-Pênaseya tîpên kelijandinê bide.**

**2-Ji bo her tîpeke kelijandinê Mînakekê bide.**

**3-Ji peyvên jêr ên rast û şaş hatiye nivîsandin ji hev cûda bike.**
Avaî, biîne, biajo, bêerk, bial, xwezaî, duemîn,ronahî, perwerdehî

## WANEYA-6
## TÎPÊN DUBAREKIRÎ

**Pênase:**Di Kurmanciya jorîn de du tîpên wekhev nayê rex hev. Dema bê jî yek ji wan dikeve. Ji aliyên din ve tîpên nêzî hev jî dema tên rex hev yek ji wan dikeve.
**Mînak**:

| | |
|---|---|
| Xurt+tir=xurtir | rind+tir=rintir |
| Paş+şîv=paşîv | pişt+dawî=pişdawî |
| Gel+lek=gelek | |

### Hîndekarî
### Bersivên pirsên jêr bide

**1-Ji peyvên jêr ên rast û şaş hatiye nivîsandin ji hev cûda bike.**
Gellek-xurtir-serokkomar-paşîv

**2-Nivîsara jêr redekte bike.(Ev pirs hemû waneyên ku heta niha hatine dîtin dixe nava xwe.)**

‘Dibistana me li derve, li ber sîya darekê ye.ji ber ku xwezaî ye, Perwerde lê gellekî xeş e.Refa me, refa duwemîn e. her çiqas asta xwandekarên me bilindtir be jî, ji ber ku giranîyekê nadin karê malê, her tim kêmasîyên wan hene.Iro hevala arîn xarinpêj bû; Le ji ber ku xarina xwa bêxwîyê bû, gellekî bêtam bû.îşev jî, ji ber ku hevalê bager xeta elektirîkê xira kir ronaî ya me nebû.’

## WANEYA-7
## KITE(KÎTE)

**Pênase**:Bi vekirina devê mirov dengek derdikeve, ji vî dengî re **kite** tê gotin. **Kite** ji yek tîpî heta pênc tîpan çêdibe.

**Minak**:

Kiteyên **yek** tîp:a-e-ê-i-î-o-u-û
Kiteyên **du** tîp:al-ra-fe-zo
Kiteyên **sê** tîp:reş-van-zil
Kiteyên **çar** tîp:deng-teng-xurt-kurd
Kiteyên **pênc** tîp:stran-stand-şkeft

### Hîndekarî
### Bersivên pirsên jêr bide

**1-Kite çi ye? Hevokên jêr li gorî kite veke.**

-Jin jiyanê diafirîne.
-Divê mirov ji bo azadiyê têbikoşe.
-Zimanê Kurdî kevnare ye.

**2-Li jêr kîjan hem kite hem jî tîp in?**

a, za, kal,e, deng, ê, stran, i, zêr, î, wê, o, ol, u, du, û, zû

**3-Li jêr kîjan hem kite hem jî peyv in?**

a, za, kal,e, deng, ê, stran, i, zêr, î, wê, o, ol, u, du, û, zû,zî, mir, têre,pênc, wane, kite, şkeft

## WANEYA-8
## PEYV(BÊJE)

**Pênase**:Ew tişte ku ji kiteyekê yan çend kiteyan pêk tê û xwediyê wate û peywirekê ye.

**A-Li gorî hejmara kiteyan peyv dibin du beş:**

**1-Peyvên yekite**:av-sar-germ-şkeft

**2-Peyvên pirkite**:baran-raxistin-dewlemend

**B-Li gorî wateya xwe peyv dibin sê beş:**

**1-Peyvên hevwate**:Wateya van peyvan yek e, lê belê xwendin û nivîsandina wan ji hev cûda ne.

**Mînak**:

gotin=peyv=şor=qise=xeber=bêje      Mînak=nimûne

gelemperî=giştî

**2-Peyvên hevdeng:**Xwendin û nivîsandina van peyvan yeke,lê belê wateya wan ji hev cûda ne.

**Mînak:**

Şîn:1-Rengê şîn      2-Giyayê şîn      3-Girî û dilzarî

ber:1-kevir      2-pêş=lihimber

**3-Peyvên dijwate**:Wateya wan dijî hev in.

Bihuşt**X**ojeh      reş**X**spî      xizan**X**dewlemend

**C-Li gorî çêbûnê(sazbûnê) peyv dibin sê beş:**

**1-Peyvên xwerû**:Ev cure peyv ji hemanekê tenê pêk hatiye lewre jedere(koke).Dema ji hev bê xistin wateya xwe ji dest dide.

**Minak**:

Dest=de+st=d+est=des+t(her sê çewtin)

roj,dar,teng,reş...h.w.d.

**2-Peyvên hevgirtî(hevedudanî)** : Du peyvên serbixwe tên li gel hev peyveke nû sazdikin

**Mînak:**

Çav+reş=Çavreş      Ser+dar=serdar

**3-Peyvên pêkhatî(tûredayî):**

Ev beşên peyvan bi alîkariya pêşgir, navgir û paşgiran sazdibin.

**Mînak**:

ra+bûn=rabûn („ra-„pêşgire)      ve+dan=vedan(„ve“pêşgire)

ji şewitinê=şewat(„a“navgire)
ser+e+rast=sererast(“e”navgire)
şad+î=şadî(„î“paşgire)   diz+ek=dizek(„-ek“paşgir)

## Hîndekarî

## Bersivên pirsên jêr bide

**1-Pênaseya peyv bide.**
**2-Peyv li gorî hejmara kiteyan dibin çend beş? Ji her beşekî pênc Mînakan bide.**
**3-Li gorî sazbûna(çêbûna)xwe peyv dibin çend beş? Ji bo her beşekî du Mînakan bide**
**4-Pênaseya pêşgir, navgir, paşgir bide.**
**5-Pênc pêşgir, du navgir û deh paşgiran binivîse.**
**6-Pênaseya peyvên hevwate(hemwate) bide û deh Mînakan bide.**
**7-Pênaseya peyvên hevdeng bide û deh Mînakan bide.**
**8-Pênaseya peyvên dijwate bide û deh Mînakan bide.**

## WANEYA-9

## TEWANG

**Tewang;** peyvan bi me ji aliyên zayendî û mêjerê ve dide nasandin.
Parekên(qertafên) tewangê sisê ne:
**1-“-ê” kit û mê**
**2-“-î” kit û nêr**
**3-“-an”kom**
**Mînak:**
Ez hevalê dibînim.   Ez wê dibînim.
Ez hevalî/hevêl dibînim.   Ez wî dibînim.
Ez hevalan dibînim .   Ez wan dibînim.
Pareka(qertafa) tewangê ya navî:
**„-ê“** Tenê ji bo navên nêr e.
**Mînak**:

Ez şivanî(şivên) dibînim.
Zava(zavê) gavan(gavên)

**Hîndekarî**
**Bersivên pirsên jêr bide**

**1-Tewang çi ye?**

**2-Qertafên(parekên) tewangê binivîse.**

**3-5 Mînakên mê, 5 Mînakên nêr, 5 Mînakên kom û 5 Mînakên netar bide.**

## WANEYA-10
## VEQETANDEK

**Pênase**:Du peyv bi alîkariya hinek parekan bi hev ve têne girêdan, ji wan parekan re **veqetandek** tê gotin. Bi riya veqetandekê tiştek ji yên din, ji aliyê zayend û mejerê ve tê veqetandin.

**1-Veqetandekên diyar(binavkirî):**
**"-a" kit û mê** :Hevala min hat.
**« -ê »kit û nêr**:Hevalê min hat.
**„-ên"kom :**Hevalên min hatin.
**2-Veqetandekên nediyar(nebinavkirî)**
**„-ek"kit**:Hevalek hat.
**„-in" kom**:Hevalin hatin
**„-ekî"kit û nêr**:Hevalekî min.
**„-eke"kit û mê**:Hevaleke min.
**"-ine"kom** :Hevaline min.
**„-ino"kom**:Hevalino
**„-ekê"kit û mê**:Hevalekê got.

**„-an“kom:**hevalinan got.

**Hîndekarî**

**Bersivên pirsên jêr bide**

**1-Pênaseya veqetandek bide.**

**2-Cewaziya tewang û veqetandek bi Mînakan diyar bike.**

**3- Cewaziya*”-ekê*” û “*-eke”* bi Mînakan diyar bike.**

**4-5 Mînakên mê, 5 Mînakên nêr, 5 Mînakên kom bide.**

## WANEYA-11
## NAV(NAVDÊR)

**Pênase:**Ji tiştekî mirov dide nasîn re **nav** tê gotin.

**A-Ji aliyê wateyê ve nav**:

**1-Navên şênber(heyberî=berbiçav):** Ew navên ku bi çav tên dîtin, bi dest tê girtin yan jî giranî û hecmekê xwe heyî re navê şênber tê gotin.

**Minak**:

Ber, dar, sêv, ax...

**2-Navên Razber (rewanî):**Hebûna wan bi çavan nayê dîtin, lê tê zanîn an jî tê bawerkirin, tiştê hestî ne.

**Mînak**:

Evîn, bawerî, rûmet...

**B-Ji aliyên taybetî ve nav:**

**1-Navê taybet(serenav):**Ji ew navên ku heyînekê tenê didin naskirin re navê taybet tê gotin.

**Minak:**

Firat, Amed, Gulistan, Cûdî,...

**Têbînî**:Ev cure nav di her cihê hevokê de bi tîpa girdek dest pê dikin.

2- Hevenav (Navên tûxs= nifşî ): Ji vî navî gelek peydadibin.

**Mînak**:

Pênûs, dar, kevir...

**Têbînî:**Ji bilî destpêka hevokê bi tîpên hûrdek despêdikin.
**3- Komanav (Navên koman):** Ji ew navên ku di xwezayîbûna xwe de yan jî di koka xwe de komin re **komenav** tê gotin.
**Mînak**:
Kerî, gel, ref, bir, artêş, êl...
**Têbînî**:Ji bilî destpêka hevokê bi tîpên hûrdek destpêdike.

**C-Li gorî çêbûna(sazbûna) xwe nav**:
**1-Xwerû**:aş,nav,meh...
**2-hevgirtî**:avaşîn,dildar...
**3-Pêkhatî(tûredayî):**aşvan,avî,..

**Hîndekarî**

**Bersivên pirsên jêr bide**

**1-Nav çi ye?**

**2-Bi Mînakan beşên navan diyar bikin.**

**3-Navên ku li her cihê hevokê bi tîpa mezin destpêdike kîjan e? Bi Mînakan diyar bike.**

## WANEYA-12
## CÎNAVK (BERNAV)

**Pênase**:Ji peyvên ku şûna navan tên bikaranîn re **cînavk** tê gotin.
**1-Cînavkên kesî(kesane):**
**Xwerû** (ez,tu,ew,em,hûn,ew)
**Tewandî**(min,te,wî/wê,me,we,wan)
**Mînak**:

| | |
|---|---|
| **Ez**ê xwarinê bixw**im**. | Min xwarin xwar. |
| **Tu** çawan **î**? | Te çi kir? |
| **Ew** diç**e**. | Wî/wê av vexwar. |

**Em** diç**in**. Me dar şikandin.
**Hûn** çi dik**in**? We çi kir?
**Ew** diç**in**. Wan barkir.

**2-Cînavkên nîşandanê(şanîdanê)**

ew(dûr) ev(nêzîk) vî(nêzîk-nêr) wî(dûr-nêr)
vê(nêzîk-mê) wê(dûr-mê) Hemû kitin.
van(nêzîk-kom) wan(dûr-kom)

**Mînak**: .

Ev/ew çûn. Vî/wî/vê/wê kinc şûştin. Van/wan mala me xirakir.

**3-Cînavka vegerok:"XWE"**

**Mînak**:

Ez **xwe** dibînin. Azad birayê **xwe** dît**.**

**4-Cînavkên nediyar(nebinavkirî):**Yek,hin,tu,kes,kesek,her,ewk,çîk,filan,bêvan,giş,hemû, heryek,mirov...

**Mînak**:

**Yekê/î** sêv xwar. **Hin** diçin. **Tiştek** nîne.

**5-Cînavkên jimarî:**

Mînak:

**Çaran** name xwend. Îro **deh** meşiyan.

**6-Cînavka parekî(qertafî**): « ê »

Mînak :Min gote wê/wî=Mim got**ê**

**7-Cînavkên zeliqandî(pêvebestî**) :

ez im tu yî ew e
em in hûn in ew in

**Mînak**:

**A-Dema nav û rengdêr bi dengdêr biqed e**:

Ez gundî **me**. Em gundî **ne**.
Tu gundî **yî**. Hûn gundî **ne**.
Ew gundî **ye**. Ew gundî **ne**.

**B-Dema nav û Rengdêr bi dengdar biqede** :

Ez mirov im. Tu mirov î. Ew mirov e.
Em mirov in Hûn, mirov in Ew mirov in

**C-Dema lêker be:**

Ez diçim. Tu diçe. Ew diçe.

Em diçin Hûn diçin Ew diçin

**8-Cînavkên berbihevîn**:"Hev û din" ,"êk û du"

**Mînak:**

Em birayê hev in. Em birayê êk in.

Me hev û din nedît. Em hevalê êk û du ne.

**9-Cînavkên daçekî(lihevxistî) :**

Jê,tê,pê,lê,jê re,tê de,pê ve

**10-Cînavkên xwemalî(xwedîtiyê)** :Veqetandekên binavkirî(a,ê,ên) dema tê ber cînavkên kesî yên tewandî,cinavkên nîşanî û cînavka « xwe » cînavkên xwemalî pêk tê.

A (min,te,wê/wî,me,we,wan,vî/ê,van,xwe)

Ê (min,te,wê/wî,me,we,wan,vî/ê,van,xwe)

Ên (min,te,wê/wî,me,we,wan,vê/vî,van,xwe,hev,êk)

**Mînak**:

Ev mala kê ye ?

Ê min e.

**11-Cînavka girekî**:"ku"

Mînak:

Mirovê ku min dît, hevalê min e.

**12-Cînavkên pirsyarî** :

Kî, kê, çi, kîjan, çend

## Hîndekarî

## Bersivên pirsên jêr bide

**1-Pênaseya *Cînavk* bide.**

**2-Cînavkên kesane yên xwerû û tewandî binivîse û ji her cînavkekê hevokek saz bike.**

**3- Cînavkên nîşandanî yên xwerû û tewandî binivîse û ji her cînavkekê hevokek saz bike.**

# WANEYA-13
# RENGDÊR(BERJENG)

**Pênase**: Ji peyvên reng, awa, rewş, hejmar, cih û hemû taybetmendiyên navan diyar dikin re **rengdêr** tê gotin.
**Cureyên rengdêran**
**1-Rengdêrên çawaniyê(wesfîn)**
Mînak :
Gundê me **nêzîk** e. Mirovê **baş**. Keçika **bedew**. Xortê **jêhatî**.
**2-Rengdêrên nîşandanê**:Dema „ew,ev,vî,vê,wî,wê,van,wan“ navan nîşanî mirov didin, dibin **rengdêr**.
Mînak:
Ev çû mala xwe. (ev cînavke)
Ev heval çû mala xwe.(ev rengdêre)
**3-Rengdêrên nediyar(nebinavkirî)**
Mînak:
**Piçek** xwarin. **Filan** heval. **Hebek** meş. **Hemû** gundî.
**4-Rengdêrên jimarî**:
**Mînak**:
**Şeş** mirov. Gulê bû **yekemîn**.
**5-Rengdêrên pirsyarî:**
**çawa**:Ji bo rengdêrên rewşê tê pirskirin.
**Mînak:**
Dara sipîndare bilind e.
Dara sipîndarê **çawa** ye?
**Bilind** e.
**Kîjan**:Ji bo diyar kirina rengdêrên nîşandanê tê pirskirin.
**Mînak:**
Ev heval.
**Kîjan** heval ?
**Ev**
**Çend** :Ji bo diyar kirina rengdêrên jimarîn tê pirskirin.
Şeş dar.
**Çend** dar ?
**Şeş**.
**Çiqas**:Ji bo diyar kirina rengdêrên nediyar tê pirskirin.
**Piçek** xwarin.

**Çiqas** xwarin?
**Piçek.**
**Di rengdêran de paye:**
**Baş   baştir  baştirîn**.
Zozan hevaleke **baş** e.
Zelal hevaleke **baştir** e.
**Baştirîn** heval Zîlan e.

## Hîndekarî
## Bersivên pirsên jêr bide

**1-Rengdêr çi ye?**

**2-Li gorî beşên rengdêran Mînakan bide.**

## WANEYA-14
## HOKER(TÊGIR)

**Pênase**:Hoker lêkera bi me ji aliyên dem, cih, rewş û hejmaran ve dide nasandin.

**Beşên hokeran**

**1-Hokerên çawaniyê**:

Mînak:  Çûk **bilind** firî.           Zîlan **hêdî** dimeşe.

**2-Hokerên demî:**

Mînak: **Duh** hevalê min hat. Ezê **serê sibehê** biçim kar.

**3-Hokerên cih û bergehê:**

Minak: Ew **bi wir de** çû. Em biçin **gundê** me.
Viyan ji **dibistanê** tê. Ew ji min **dûr** ket.

**4-Hokerên çendanî û hevrûkirinê:**

Mînak: Ew heval **kêm** diaxive. **Deh bi deh** diçin. Zinar **pir** dixebite. Wî **zêde zêde** xwar.**Car caran** tê

**5-Hokerên pirsyarî**:

Çawa,çi,kengî,çi wext,li ku,ji ku,biku ve,çiqas

Minak:

Tu **ji ku** têyî? Ez **ji mal** têm.
Şînda **çawa** dimeşe? **Xweş** dimeşe.
Tu **kengî** hatî? **Duh** hatim.
**Çiqas** meşiya? **Gelek** meşiya.

## Hîndekarî
## Bersivên pirsên jêr bide

**1-Hoker çi ye?**

**2-Pênc hevokên ku tê de hoker heye sazbike û bin hokeran xîz bike.**

## WANEYA-15
## DAÇEK

**Penase:**Bi serê xwe tu wateyê nadin, lê belê hevokê ji alîyên wateyê ve temam dikin.

**Daçekên bingehîn: li-bi-ji-di**

Mînak:

Ez **li** Qendîl dijîm.  Ez **bi** erebeyê çûm bajêr.  Ez **ji** Amedê me.  Ew belaya xwe **di** min dide.
**bi....re**: Emê **bi** hev **re** biçin.
**bi....ve**:Tu **bi** ku **ve** diçî.
**bi... de**: Xanî **bi** ser **de** ket.
**ji.....re**: **Ji** min **re** bîne.
**ji....ve**:**Ji** niha **ve** xwe amede dike.
**di ....de**:**Di** nav **de** rûnişt.
**di.....re**:Av **di** ser **re** çû.
**Hin daçekên din:**
li paş,li ser,li bin,li ber,li nav,li kelekê,li pey,li dûv,li pişt,li jêr................
bi dûv,bi baş,bi dor,bi ber,bi bin,bi pişt,bi rex,bi dawiyê,bi kêlekê............
ji ber,ji dor,ji pişt,ji aliyê,ji kêleka,ji paş,ji hêla......................................

## Hîndekarî
## Bersivên pirsên jêr bide

**1-Daçek çi ye?**

**2-Ji bo her daçekekî du hevokan sazbike.**

# WANEYA-16
# GIHANEK

**Pênase:**Gihanek peyvan û hevokan bi hev ve girê didin, an jî peyvekê bi hevokekê ve girê didin.
**Gihanekên serke:**û,bila,bes,çawa...wisa,jî,her çend,lewre,dibe ku,dema ku,heta ku,mixabin,ango,lê,lê belê,ji ber ku,heke na,çi....çi,hem....hem jî...û hwd.

Mînak:
Tu kengî têyî tu bi kêfa xwe yî**,bes** tu were.
Tu here, **dibe ku** ew jî li pey te were.
Şêr şêr e **çi** jin **çi** jî mêr.
**Dema ku** tu çûyî ,ji min re nameyan bişîne.

## Hîndekarî
## Bersivên pirsên jêr bide

**1-Gihanekçi ye?**

**2-Ji pênc gihanekan pênc hevok sazbike.**

**3-Di navbera daçek û gihanekan de çi cûdahî heye?**

## WANEYA-17
## BANEŞAN

**Pênase:**Mirov hestên xwe yên germ û gur bi alîkariya baneşana dide der.
Mînak:
Ax!,wax!,hey!,lo!,hey lo!,lê!,errik!,ey!,hey wax!,ox!,ox xweş!,de! û h.w.d.

**Ax dilo**,wiha meke! **Hey lo hevalo**! **Wî**! Kurê min çima tu wiha dikî. **Of**! Tu zanî ez çiqas tengav bûme.

## WANEYAN-18
## JIMARNAV

**Pênase:**Ji navên hejmaran re tê gotin.

Yek=1 yazdeh=11 sih=30
sedhezar=100.000
Du=2 duwazdeh=12 çil=40
milyon=1.000.000
Sê=3 sêzdeh=13 pêncî=50
Çar=4 çardeh=14 şêşt=60
Pênc=5 pazdeh=15 heftê=70
Şeş=6 şazdeh=16 heştê=80
Heft=7 hevdeh=17 nod=90
Heşt=8 hejdeh=18 sed=100
Neh=9 nozdeh=19 hezar=1.000
Deh=10 bîst= 20 dehezar=10.000

## WANEYAN-19
## LÊKER(KIRIN)

Pênase:Karê ku tê kirin diyar dike.
Minak:
Kirin, firotin, nivîsandin, kuştin, şuştin, çandin.................

**Gerguhêzî(têperî**)

Di hin lêkeran de karê ku tê kirin li kirde vedigere,an jî bireser nagire ;ev cure lêker **negerguhêzin(têneperin).**

Mînak:

Ez(kirek) diçim.(lêker)  (Karê çûndinê bandorê li min dike.)

Lê belê hin lêker hene ji bilî kirek bandorê li kes/tiştekî din dikin.Lewre bireser digirin.Ev cure lêker **gerguhêzin(têperin).**

Mînak:

Şîlan darê jêdike. (Dar tê jêkirin ,lewre dar di bin bandora çalekiyê de dimîne.)

## DEM

**1-Dema niha**:Pareka „**di**“ tê ber lêkeran.

**(**di+ koka dema niha+pareka kesan**)**

**Mînak:** Ez **di**kim (di:Daçeka dema niha ye. k:koka lêkera kirinê ye. –im:pareka kesa/ê yekemîn e.

Ez diçim.

**Têbînî:**Di dema niha de cînavk her tim xwerû ne.

**2-Dema bê:**Bi alikariya „dê,wê û ê“pêk tê.Pareka „bi“ jî tê ber lêkeran. („ê,dê,wê“+...+bi+ koka dema niha+ pareka kesan)

Mînak:

Ez**ê bi**kim.(ê :pareka dema bê. bi:Daçeka dema bê. k:koka lêkera kirinê ye. –im:pareka kesa/ê yekemîn e.)

Ezê biçim

Tu **dê b**ikûjî.

Ew **wê bi**kûje.

**Têbînî:**Di dema bê de cînavk her tim xwerû ne.

**3-Demên borî**:

**A-Boriya sade:**

**Mînak**: Min kir.

Ez çûm.

**B-Çîrokiya têdeyî(boriya veger)**

**Mînak**:

Min kiri**bû**.

Ez çû**bû**m

**C-Boriya berdest (berdewam)**.

Min **di**kir.

Ez **di**çûm..
**D-Boriya dûdar (dûr**):
**Mînak** :
Min kiriye.
Ez çûme.
**E-Çîrokiya dema boriya dûdar**:
Mînak:
Min kiribûya.
Ez çûbûma.
**Têbînî**:Dema lêkerên gerguhêz li gorî demên borî tê kişandin cînavkên tewandî digrin. Lê belê yên negerguhêz cînavkên xwerû digrin.

## RAWEYÊN DAXWAZÎ

**1-Raweya fermanî :**(bike,bide,biçe
Mînak:
Tu kevir biavêje.
Derî veke.
Xwarinê nexwe.
**2-Raweya xwestekî:**
Mînak:
(Xwezî) Ez biçim. (Xwezî) Ez bigerim. Xwezî ez **biçûma** mala wan.
**3-Raweya bilanî:**
Mînak:
**Bila** bên. **Bila** biçe. **Bila** tu bihata. **Bila** wan bikira. **Bila** wê xwaribûya.
**4-Raweya mercî(hekanî):**
Mînak:
**Heke** ew dixwazin,bila bên.
**Heke** ew zû tên,bila werin.
**5- Raweya merc û daxwazê:**
Mînak:
Heke min firotibe. Heke ew hatibe.
Heke te dîtibe,bibêje.
**6- Raweya divêtî:**
Mînak:

Divê ez biçim. **Diviya** min hevalê xwe bitîtama.

**7- Raweya çêbiwar:"î"** tê ber raya dema borî.

Mînak:

Hevalê dilşikest**î.** Dara şînbûy**î**. Çavên nedîtî.

**Hîndekarî**

**Bersivên pirsên jêr bide**

**1-Lêker çi ye?**

**2-Pênc lêkeran li gorî sê deman bikşîne.**

**3-3 lêkerên gerguhêz û 3 lêkern negerguhêz binivîse.**

## WANEYA-20
## HEVOK

**Pênase:**Dema ku çend peyv li gorî rêz û rêçikekê li pey hev rêz bibin û wateyekê bidin, ji vê koma peyvan re hevok tê gotin

### A-HEMANÊN(BINÇÎNEYÊN)HEVOKÊ

**Kirde( kirek):**Karek ji aliyê kesekî an jî tiştekî ve tê kirin,ew kes û tişt **kirde** ye.

**Pêveber:**Tiştê ku wateya hevokê dibe serî pêveber e. Pêveber dikare ji lêker tenê jî pêk bê,dikare çend temamkarên lêkerê jî bigire nava xwe.

**Têrker(temamker):**Ji aliyê demê,cih û rewşê ve karê ku tê kirin sergihayî(temam) dike.

**Bireser ( berkar):**Kes û tiştê ku rasterê di bin bandora tiştê ku tê kirin de dimîne **bireser e.**

**Mînak**:

Ez ji mal hatim.

Ez(kirde) ji mal(têrker) hatim(pêveber)

Kawa sranekê dibêje.

Kawa(kirde) stranekê(bireser) dibêje(pêveber).

### CÛREYÊN HEVOKAN:

**A-Li gorî pêveberan hevok:**

**1-Hevokên lêkerî**:

Mînak:

Ez ji mal hatim.    Ji gund derketî.     Zîlanê nan nexwar.

**2-Hevokên navdêrî**:

Mînak:

Viyan mamoste ye.  Şîlan baş e. Navê min Nalîn e.

**B-Ji aliyê wateyê ve hevok:**

**1-Hevokên pêşkerî:**

**a-Hevokên erênî:**

Mînak:

Ez diçim dibistanê.        Ev heval baş e.

**b-Hevokên neyîniyê**:

Mînak:

Ez naçim dibistanê.       Ev heval ne baş e.

**2-Hevokên daxwazî:**

**a-Hevokên pirsyarî:**

Mînak:

Kî ji xwar hat?   Navê te çi ye?    Tu ji kuderê yî?

**b-Hevokên fermanî:**

Mînak:

Ji vê derê zû biçe.  Li gel me xwarinê bixwe.

**c-Hevokên xwestekî:**

Mînak:

Xweziya hevala min bihata.

**d-Hevokên banêşanî:**

Mînak:

Çi dengekî xweş li ser e!

## Hîndekarî

## Bersivên pirsên jêr bide

**1-5 hevokên lêkerî binivîse.**

**2-5 hevokên navderî binivîse.**

**3-Hêmnên 5 hevokan diyar bike.**

**4-5 hevokên pirsyarî binivîse.**

**5-5 hevokên fermanî binivîse.**

**6-5 hevokên xwestekî  binivîse.**

**7-2 hevokên banêşanî binivîse.**

*Kişandina Çend Lêkeran Li Gor sê Demên Bingehîn*

| **LÊKER** | **Dema borî** | **Dema niha** | **Dema bê** |
|---|---|---|---|
| Cemidîn | Ez cemidîm | Ez dicemidim | Ezê bicemidim |
| Ceribîn | Ez ceribîm | Ez diceribim | Ezê biceribim |
| Cûtin | Min cût | Ez dicûm | Ezê bicûm |
| Çerixîn | Ez çerixîm | Ez diçerixim | Ezê biçerixim |
| Çinîn | Mîn çinî | Ez diçinim | Ezê biçinim |
| Çandin | Min çand | Ez diçînim | Ezê biçînim |
| Çûn | Ez çûm | Ez diçim | Ezê biçim |
| Dan | Min da | Ez didim | Ezê bidim |
| Derxistin | Min derxist | Ez derdixim | Ezê derxim |
| Dîtin | Min dît | Ez dibînim | Ezê bibînim |
| Fetisîn | Ez fetisîm | Ez difetisim | Ezê bifetisim |
| Firîn | Ez firiyam | Ez difirim | Ezê bifirim |
| Firotin | Min firot | Ez difroşim | Ezê bifroşim |
| avêtin | Min avêt | Ez diavêjim | Ezê biavêjim |
| Gerandin | Min gerand | Ez digerînim | Ezê bigerînim |
| Gerîn | Ez geriyam | Ez digerim | Ezê bigerim |
| Gotin | Min got | Ez dibêjim | Ezê bibêjim |
| Hatin | Ez hatim | Ez têm | Ezê bêm |
| Hejandin | Min hejand | Ez dihejînim | Ezê bihejînim |
| Herikîn | Ez herikîm | Ez diherikim | Ezê biherikim |
| Hilandin | Min hiland | Ez dihilînim | Ezê bihilînim |
| Hilîn | Ez hiliyam | Ez dihilim | Ezê bihilim |
| Hilkişîn | Ez hilkişiyam | Ez hildikşim | Ezê hilkişim |
| Kelandin | Min keland | Ez dikelînim | Ezê bikelînim |
| Kirin | Min kir | Ez dikim | Ezê bikim |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Kirîn | Min kirî | Ez dikirim | Ezê bikirim |
| Nalîn | Ez nalîm | Ez dinalim | Ezê binalim |
| Nêrîn | Min nêrî | Ez dinêrim | Ezê binêrim |
| girtin | wê girt | Ew digre | Ewê bigre |
| Pejirandin | Te pejirand | Tu dipejirînî | Tê bipejîrînî |
| Pijandin | Mîn pijand | Ez dipijînim | Ezê bipijînim |
| Qelandin | Min qeland | Ez diqelînim | Ezê biqelînim |
| Qeşartin | Min qeşart | Ez diqeşêrim | Ezê biqeşêrim |
| Rakirin | Min rakir | Ez radikim | Ezê rakim |
| Rabûn | Ez rabûm | Ez radibim | Ezê rabim |
| Raketin | Ez raketim | Ez radikevim | Ezê rakevim |
| Razan | Ez razam | Ez radizêm | Ezê razêm |
| Revîn | Ew reviya | Ew direve | Ewê bireve |
| Şemitandin | Te şemitand | Tu dişemitînî | Tê bişemitînî |
| Şemitîn | Tu şemitî | Tu dişemitî | Tê bişemitî |
| Şewitandin | Min şewitand | Ez dişewitînim | Ezê bişewitînim |
| Şewitîn | Ez şewitîm | Ez dişewitim | Ezê bişewitim |
| Şikandin | Wî/wê şikand | Ew dişikîne | Ewê bişikîne |
| Şikestin | Ew şikest | Ew dişikê | Ewê bişikê |
| Veşartin | Me veşart | Em vedişêrin | Emê veşêrin |
| Weşandin | Wan weşand | Ew diweşînin | Ewê biweşînin |
| Weşîn | Ew weşiyan | Ew diweşin | Ewê biweşin |
| Xapandin | Te xapand | Tu dixapînî | Tê bixapînî |
| Xistin | Te xist | Tu dixî | Tê bixî |
| Xwarin | Te xwar | Tu dixwî | Tê bixwî |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Zanîn | Min zanî | Ez dizanim | Ezê zanibim |
| Zan | Ew za | Ew dizê | Ewê bizê |
| Zeliqandin | Te zeliqand | Tu dizeliqînî | Tê bizeliqînî |
| Zeliqîn | Tu zeliqî | Tu dizeliqî | Tê bizeliqî |

## WANEYA-21
## XALBENDÎ

**(.)** xal (**,**) bêhnok (**;**) xalbêhnok (**?**) pirsnîşan (**:**) cotxal
**( )** kevanek **“ “** dunik (**!**)bangnîşan (**-**) xêzek
(-) bendik (**...**) sêxal (‘) dabir

**1-Xal:**

1-Piştî hevokê tê.Peyva piştî xalê bi tîpa mezin dest pê dike.

**Mînak:** Agir pê dikeve.

2-Di kurtenivîsan de xal tê bikaranîn.

**Mînak:** P.K.K. Dr.Zîlan

3-Di nivîsandina reqeman de her sê xaneyan xal tê danîn.

Mînak:

6.000.000(şeş milyon)

4-Di nivîsandina mêjûyê de tên bikaranîn.

Mînak:

21.02.2006

**2-Bêhnok:**

Di nava hevokê de cihê ku mirov lê bêhna xwe vede nîşan dide.

1-Dikeve du peyvên ku erkên wan yeke.

Mînak:

Zîlan,Şîlan û Botan çûn dibistanê.

2-Hevokên kin jî hevoka bingehîn cûda dike.Di heman demê de,du hevokên serbixwe jî ji hev veqetîne.

Mînak:

Lawikê ku duh li ber derî bû;pismamê min e.

Zozanê xwarin çêdikir,Botên li radyo guhdar dikir.

3-Ji bo ku mirov hêmaneke hevokê ji hêmanên din cuda bike,mirov bêhnokê datîne.
Mînak:
Belê,êdî roja me hat.
4-Di hejmarên bin sifirê de tê bikaranîn.
Mînak:
1,5(yek û nîv)     5,5(pênc bêhnok pênc)
**3-Pirsnîşan:**
Tê dawiya hevokên pirsê.
Mînak:
Hûn ji dibistanê hatin?
**4-Cotxal:**
Gava ku di hevokê de tiştek tê gotin, an jî xisletên tiştekî têne rêzkirin,an jî wateya wê tê vegotin,cotxal tê bikaranîn.
Mînak:
Wê ji min re got:"Emê biçin"
Sê tiştên mirovên baş hen:Dilpakî,wêrekî û camêrî.
Rengdêr:Tiştê ku rengê navdêrê nîşan dide ye.
**5-Xalbêhnok:**
Dikeve navbera du hevokên bi hev ve girêdayî yên ku hev temam dikin.
Mînak:
Kulilk ne bi tenê bi rengê xwe xweş in;bi bêhna xwe jî dilê mirov geş dikin.
**6-Kevanek:**
Agahiyên ku cih girtina wan ne pêwîste, di nava kevanekê de tên dayîn.
Mînak:
Heval,duh serê sibê(bi hilatina rojê re) ji malê derketin.
**7-Dunik:**
dema ku mirov gotinekê ji devê yekê/î din bigire an jî neqil bike;mirov wê gotinê di nava dunikê(neynûkê) de nîşan dide.
Mînak:
Pêşitên me gotiye:"Rih dibe bihost,dijmin nabe dost"
Zîlan got:"Ezê sibê werim malê."
**8-Xêzek:**
Gava ku gotibêj di navbera çend kesan de çêdibe,heke gotina yekê/î di nava dunikê de neyê nîşandayîn,xêzekê datînin ber gotina wê/î.
Mînak:
Rindo ji hevalê xwe re got:

-Heval tu kengî herî dibistanê.
Hevalê wî lê vegerand:
-Ezê piştî nîvro biçim.

**9-Bangnîşan:**

Mirov bixwaze hesteke bilind(coş,xem,tirs û xof) nîşan bide, mirov bangnîşanekê dide ber.
Mînak:
Ax dilo!
Dilo yeman!

**10-Bendik:**

Dikeve navbera du bêjeyên ku di navbera wan de hogirî heye.
Mînak:
Du-sê mirov pirsa te kir.
Mîrê Botan Bedir-Xan Beg li dijî neyaran serî rakir.

**11-Sêxal:**

Dema ku mirov bixwaze bide zanîn ku hevok neqediyaye, wê demê mirov sêxalê datîne dawiya hevokê.
Mînak:
Ez ê werim û...

**12-Dabir:**

Di kurtenivîsa peyvan de qertafa tewangê bi riya dabirê tê veqetandin.Her wiha di reqeman de jî dîsa qertafa tewangê û veqetandek bi riya dabirê ji hev têne veqetasndin.
Mînak:
K.N.K.'ê daxuyaniyeke berfireh da raya giştî.
Di 1'ê gulanê de karker meşiyan.

***Hîndekarî-1***

***Nivîsara jêr ji aliyên xalbendiyê ve sererast bikin*.**

Hevalno divê hemû kes guhê xwe bide ser waneyê xwe tu kes di dayikbûna xwe de fêrî xwendin û nivîsandinê nabe ma ne wiha ye bi taybetî mirov tiştên digre bi perwerdeyê digre

Nezanbûn ne şerme ji ber ne tewana mirov e lê xwe ne fêrkirin tewan e mirovê dixwaze di nava mirovahiyê de xwediyê cihekî girîng be divê xwe ji nezanbûnê rizgarbike bi vê sedemê nivîsandin xwendin tecrûbegirtin û lêkolînkirin pêwîst e

Mînak dema mirov dinivîsîne kedekê dide û ev jî rehetiyeke giyanî çêdike dema mirov dixwîne tiştekî nû fêr dibe û ev jî mirov zana dike
Her mirovek evîneke wî/wê heye evîna we jî pêwîste xwendin û nivîsandin bi zimanê dayika xwe be ger hûn wekî evînekê nêzîkî

xwendin û nivîsandinê bibin wê ev yek daxwaz coş wêr û hêviya we xurt bike û ev yek jî wê rêka serkeftinê li pêşiya we veke ma ne wisa ye gelo kî dikare bêje ev yek rast e ma her mirovek bi evîna di dilê xwe de najî û nameşe evîna yekî/ê welat e ya yekî/ê azadiye ya me jî bila xwendin û nivîsandin zimanê dayikê be

## HÎNDEKARÎ-2

***Hevokên jêr hem ji aliyên wateyî, hem jî ji aliyên rast-nivîsî de rast bike***

1-nave ez şîlane ......................................................................
2-nave tu çiye?.....................................................................
3-nave ew  zinare..................................................................
4-min jî amede me..................................................................
5-wi baş avjeniyê dike...........................................................
6-wê jî  ew re gotin...............................................................
7-gunda em sûrede ye..........................................................
8-me here kurdistana.............................................................
9-vi gunda me ye...................................................................
10-min ji qendîl dijîm.............................................................
11-we ji kurdistana ne...........................................................
12-bi hêla tu kî rabû...............................................................
13-tu ji em re çi anî...............................................................
14-ew ji ava re derneket........................................................
15-.min ji sêvên re hezdikim...................................................
16-emê hev re biçin dibistane................................................
17-ew ji hevalê zilan hezdike.................................................
18-min bi hevala miho heznakim...........................................
19-gundiyên êriş birim li ser mala me...................................
20-we xandekarên kuderê ne?................................................
21-jîyan ev ki ye u ji ku têm...................................................
22-me gellek xarin dixwe.......................................................
23-serokkomar xurttir dimeşim..............................................
24-wê goştê bi xîn tîne...........................................................
25-wî u delalî iro bi hev re çû.................................................

## HÎDEKARÎ-3

Hevokan bi peyvên guncan temam bikin.

(pêş,hez, gotinên pêşiyan, telefon, kevçî, saet, derî, daristan, rovî, dar)

1. Ez gelekî ji xwendinê …………………… dikim.
2. Pêlîstokên zarokan bi ………………………dixin.
3. Di pêlîstokên Viyanê de ……………yek jî hebû.
4. Dengê…………………..a mala Derya pir zêde bû, diçû heya mala cîranên wan.
5. Dayika Deştî tam di…………a xwe de diçe kar.
6. Her odeyeke malê …………………yekî wê heye.
7. Zarok pir hez dikin ku hilkişin ser ………… .an.
8. Me di biçûkahiya xwe de li nav ………………………bi lîstik dilîstin.
9. ………………………di nav ajalan de yê herî kone û fenok e.
10. ……………… ……………… rê nîşan didin.

Cînavkan li gorî hevokê dagirin.

1. Dema Jana hat Amedê,….ji wir çûbûm Mêrdînê.
2. Piştî ku Seyrê hat,……………dîtim û gazî min kir.
3. Dawiya hefteyê gundiyên…………..giş bi hev re çûn ber Çemê Dîcle.
4. Îcar piştî ku ew hatin bi katjimêrekê ………hatin.
5. Di pey me re ……….jî hatin û beşdarî me bûn.
6. Lê her çiqas min dixwest te bibînim jî …………nehatibûyî ber çem.
7. Hêviyê ji………re pirtûk kirî.
8. ……ji Ronakê re got,lê wê li min guhdarî nekir.
9. …………..li Amedê komeke zarokan çêkir û çûn serdana deverên dîrokî.
10. …………jî ji zarokan re gul berhev kirin.
11. Emê îşev bên mala …………
12. ……………Rojgirav dît, lê wî te nedîtî.
13. ……………dest bi dibistanê kir.
14. ……………pirtir ji hespan hez dikir.
15. ……………bi şeyalan hespan dijiyam.
16. ………….ê çawan pêşbirkên jokeriyê qênc bikim.
17. …. di waneyê de jî li ser ajotina hespan difikirim.
18. ……………..carinan bi seatan li ser darê dimam.
19. ……………..hesp tîmar dikirin.

20. ……………..êm dida hespan.
21. …………….bi xwe re tişt dibirin.
22. ………..ji malê şekir didizî û dibir dida hespan.
23. …………….şekir pirtir dida Dîkîs.
24. …………….çûm ber golê.
25. ……………pir ber ketim.
26. ……………ji mamosteya xwe ya jokeriyê pirsî.
27. ……………wê şeve gelekî giriyam.
28. …………….ê tu carî nikaribim wî bibînim.
29. ……………nizanim, wê şevê ez kengî razam.
30. ……………kêfxweş bûm ku hatim gel te.

Peyvên li jêr li gorî cînavkên xwerû û tewandî di nav hevokê de bikarbînin.

Xwarin,hatin,nivîsandin,xwendin,razan,çûn,gerîn,ricifîn.

## HÎNKARÎ-4

Hevok jêr bi awayekî watedar û rastnivîsî ji nû ve saz bikin.

1-ve dola suredê duh barîna li berfê ne ji rawestiyaye
1-……………………………………………………….
2-berf dibe dema erd spî dibare
2………………………………………………………
3-ew bedew di hevala ber deriyê derbas bû me lê min re nedît
3-………………………………………………………
4-ji pê de tu vir û li biaxive guhdarî ezê bikim te
4-……………………………………………………
5-bigre daristanê dikare li dar sûd hene gelek ku mirov ji wana
5-………………………………………………………
6-ku li derî ber rûniştibû û hindik dev mabû direya li bike min seyê
6-……………………………………………………
7-Herkes ku em azadî ji û bo serxwebûna dizane vî serê gelî derketin çiyan
7-………………………………………………………
8-Wê rojek ku careke bê din emê deşt û bajaran bijîn û di rojên dakevin azad de .
8-………………………………………………………
9-Canê bû berbangê de di dema hişyar û dest bi karê çêkirina malê kir.

9-……………………………………………………………
10-çiyayek ye her xwediyê bilindbûnekê
10-…………………………………………………………
11-mirov her azad û wekhev bijî dixwaze .
11-………………………………………………......................
12-deste mirov bi xwe ava azadiyê dike;kesek ber ji nade mirov xwe ve.
12-…………………………………………………………
13-rojên hêviya azad pêjerojê yên em têdikoşin.
13-…………………………………………………………
14-amedê ji ez paytexta ji hez ku kurdistanê ber dikim ye.
14-…………………………………………………………
15-kurdan mezin newroze herî cejna pîroz û ya .
15-…………………………………………………………
16-perwedeya jîrîn lê şagirtên û ziman nebûn ji mamoste dibistana derfet ber nebûn hemû kurdî.
16-…………………………………………………………
17-ziman bîrdoziyê şaşe ji perwerdeya qut ku dike nêzîkbûna.
17-…………………………………………………………
18-bixwînî bibînî tu ku pirtûkek e ger mirovek bizanî tuyê her
18-…………………………………………………………
19-min tixubê min e zimanê tixubê cihana
19-…………………………………………………………
20-gotin xwe mirov mirov bi vegotina dibe û
20-…………………………………………………………

## EZMÛNA ZIMANÊ KÛRDÎ-1

**P1-Tîpên kurdî ên girdek û hûrdek li gorî rêzan wan binivîse.(10P)**

**P2-Tîpên kurdî ên dengdêr li gor beşên wan ên rast û kin binivîse.(10P)**

**P3-Kite çi ye?Hevoka li jêr li gorî kiteveke.(10P)**

Hevok:Jin jiyanê diafirîne.

**P4-Tîpên cêwî û yên kelijandinê binivîse.**

**P5-Peyvên li jêr bike hevok.(10P)**

Têkoşîn, Dihat, Bilind, Hûn, Li

**P6-Îro çi roje û em di kîjan meh û demsalê de ne?(10P)**

**P7-Dijwateya peyvên jêr binivîsîne.(10P)**
Bilind, bihuşt, Dewlemend, ronahî, rast
**P8-Hevwateya peyvên jêr binivîse.(10P)**
Bêje,mînak, soberî, gelemperî, sol
**P9-Nivîsandina jêr redekte bike.(20P)**
Dibistana me li derve, li ber sîya darekê ye.ji ber ku xwezaî ye, Perwerde lê gellekî xeş e.Refa me, refa duwemîn e. her çiqas asta xwandekarên me bilindtir be jî, ji ber ku giranîyekê nadin karê malê, her tim kêmasîyên wan hene.Iro hevala arîn xarinpêj bû; Le ji ber ku xarina xwa bêxwîyê bû, gellekî bêtam bû.îşev jî, ji ber ku hevalê bager xeta elektirîkê xira kir ronaî ya me nebû.

## EZMÛNA ZIMANÊ KURDÎ-2
## RÊBER APO

Zarokek di 4'ê Nîsana 1949'an de li gundê Omeriyan,yê girêdayî Xelfeta bajarê Ruhayê ji dayik bûye. Navê wî dikin Ebdûllah. Navê bavê wî Emer e,navê dayika wî Ûveyş e.

Di dema xwendekariya xwe de zîrek û bi rûmet bû, ji aliyên heval û mamosteyên xwe ve gelek dihat hez kirin.

Rêber Apo di 1970'an de bi çepgirên gelê Tirkan re tevlî çalekiyên şoreşgerî dibe.Di 1973'an de bi komek hevalên xwe re dest bi xebatên bîrdozî dikin. Di 27'ê Mijdara 1978'an de P.K.K. tê damezrandin. Di 15'ê Tebaxa 1984'an de bi pêşengtiya heval Egîd şerê çekdarî dest pê dike. Di 15'ê Şibata 1999'an de bi komloyeke nav netewî dîl hate girtin.

### Bersiva pirsên jêr bide:

**1**-Rêber APO kengî û li ku ji dayik bûye? (4P)
**2-**Rêber APO di dema xwendekariya xwe de çawa bû? (2P)
**3-**Dîroka damezrandina P.K.K.,şerê çekdarî û dîl girtina rêber APO binivîse. (6P)
**4-**Navê du pirtûkên Rêber APO binivîse.(4P)
**5-** Tîpên dengdêr, dengdar, cêwî û kelijandinê binivîse.(10P)
**6-**Kite çi ye? Ji mijara RÊBER APO,benda(paragrafa) duyemîn li gorî kite veke. (10P)
**7**-Hevwateyên peyvên jêr bide. (10P)
Sewal, pêdivî, werz, fêrbûn, duçeng
8-Dijwateyên peyvên jêr bide.(10P)
Dirêj, baş, ronahî, bihuşt, paşverû

**9-**Her yek ji peyvên jêr di hevokekê de bikarbîne.(10P)
Rêber, şehîd, dikir ,dixwe ,gul

**10-**Hevokên jêr ji aliyên wateyî û rastnivîsî ve rast bike.(10P)
-navê ew viyane û wê diçin dibistanê.
-te çi li ew tiştên wir bikî
-piştî ku min xwarin dixwim û diçin wêneyê hevalê zagros temaşa dike.
-wî ji kurditanêye, Te ji kuderê yî
-Ma te ne bajarî ye, çima ew weke gundiyan diaxive

**11-**Îro çi roje? Em niha di kîjan meh û werzê de ne? Binivîse.(6P)

**12**-Di nivîsandina jêr de şaşîtiyên hene rast bike û bi nivîsandineke xweş ji nû ve binivîse. (18P)

Xendekarên hêja; her çiqasî hûn xemgîn bin jî, pêwîste ku hûn bi xe gellek xarinê,di avaîya
dibistanê de bixwin.
di jîyanê de mirov bi tenduristî xarin bixe,wê gellek xurttir bimeşe.
Xwanîyê malbata Ronaî xeşe. ji ber vê me paşşîva xe li gel dayika ronaî xar.

## EZMÛNA-TEST-1

**1-Li jêr kîjan tîpên hûrdek û li gorî rêzan xwe hatiye nivîsandin?**
A) A-B-C-Ç-D-E-Ê-F-G-H-I-Î-J-K-L-M-N-O-P-Q-R-S-Ş-T-U-Û-V-W-X-Y-Z
B)a-b-c-ç-d-e-ê-f-g-h-i-î-j-k-l-m-n-o-p-q-r-s-ş-t-u-û-v-w-x-y-z
C)A-B-C-Ç-D-Ê-E-F-G-H-I-Î-J-K-L-M-N-O-P-Q-R-S-Ş-T-Û-U-V-W-X-Y-Z
D)a-b-c-ç-d-e-î-i-j-k-l-m-n-o-p-q-r-s-ş-t-û-u-v-w-x-y-z
**2-Ji tîpên jêr kîjan dengdêrin?**
A)gbcghjk B)sdfghjkl C)aeêiîouû D)bgfdkmn
**3-Ji tîpên jêr kîjan dengdar in?**
A)sdfghjkl B)aeîo C)eiu D)aêîoû

**4-Ji hevokên jêr kîjan li gorî kite rast hatiye vekirin?** A)Bar-an-xweş-di-ba-re.
B)Zer-deş-tî-ol-ek-e-kev-na-re
C)Ji-ya-na-xwe-bi-pa-rê-zin
D)Ten-du-ris-tî-ya-mi-ro-van-ji-pa-qi-jî-yê-tê.
**5-Ji hevokên jêr kîjan şaş e ?**
A)Navê min Zîlan e. B)Navê wê Sosin e. C)Navê tu çi ye D)Navê wî Dijwar e.
**6-Ji hevokên jêr kîjan rast e?**
A)Hevala Kajîn baş e.
B)Hevalê Adar jîr e
C)Hevalan me zirek in
D)Hevalên me fêrî zimanê Kurdî dibin.
**7-Ji peyvên jêr kîjan çewt hatiye nivîsandin?**
A)Tiliyên min. B)Vîyan C)xurtir D)rintir

**8-Ji peyvên jêr kîjan rast hatiye nivîsandin?**
A)Dîyar B)paşşîv C)Deriyê malê D)Bîyanî
**9-Ji gotinên jêr kîjan şaş hatiye nivîsandin?**
A)serokkomar B)gelek C)Ev kî ye? D)Jiyan
**10-Ji peyvên jêr kîjan rast hatiye nivîsandin?**
A)xendevan B)xemgîn C)xaringeh D)xîn
**11-Ji tîpên jêr kîjan cêwî ne?**
A)a-ê-î-o-û B)h-w-y C)e-i-u D)ç-k-p-r-t
**12-Ji peyva jêr kîjan kite ye?**
A)agir B)azad C)rewş D)dawî
**13-Tîpên Kurdî çend in?**
A)33 B)31 C)30 D)34
**14-Ji tîpên jêr kîjan yên kelijadinê ne?**
A)ç-k-p-r-t B)e-i-u C)h-w-y D)b-c-ç-v
**15-Ji peyvên jêr kîjan şaş e?**
A)ronahî B)xwezaî C)bîne D)baş e
**16-Li jêr kîjan pevdeng e?**
A)xwo B)xwu C)xwû D)xwe
**17-Ji peyvên jêr kîjan rast e?**
A)iro B)xêdan C)avaî D)bavêje
**18-Ji peyvên jêr kîjan hem kite,hem jî peyv e?**
A)gerok B)stran C)zi D)bijî
**19-Ji hevokên jêr kîjan rast e?**
A)Min xwarin dixwim. B)Ez baş in

C)Hûn çawan in? D)Wan diçe

**20-Ji hevokên jêr kîjan şaş e?**

A)Ez dimeşim. B)Em baş in.

C)Tu baş in. D) Ew dice.

## EZMÛNA ZIMANÊ KURDÎ-TEST-2

**1-Tîpên Kurdî çend in, dengdêr û dengdar çend in?**

A) Tîpên Kurdî 33, dengdêr 8 dengdar 23 B) Tîpên Kurdî 31, dengdêr 8 dengdar 23

C) Tîpên Kurdî 31, dengdêr 23 dengdar 8 D) Tîpên Kurdî 34, dengdêr 8 dengdar 23

**2-Ji tîpên jêr kîjan cêwî û kelijadinê ne?**

A)Tîpên cêwî:A-Ê-Î-O-Û, Tîpên kelijandinê:H;W;Y

B)Tîpên cêwî H-W-Y, Tîpên kelijandinê:Ç-K-P-R-T

C)Tîpên cêwî:Ç-K-P-R-T, Tîpên kelijandinê: E,I;U

D)Tîpên cêwî Ç-K-P-R-T , Tîpên kelijandinê:H-W-Y

**3-Ji peyvên jêr kîjan rast hatiye nivîsandin.**

A)jiyan, xarin, gelek B)jîyan, xwarin, gelek

C)jiyan,xwarin,gellek D)jiyan, xwarin, gelek

**4-Ji hevokên jêr kîjan li gorî kite rast hatiye vekirin?**

A)Jî-ya-na-Kur-dis-ta-nê-xi-ra-ne-ke.

B)Zer-deş-tî-ol-ek-e-kev-na-re

C)Ag-ir-ê-new-ro-zê-geş-bi-kin

D)Ten-du-ris-ti-ya-mi-ro-van-ji-pa-qi-jî-yê-tê.

**5-Li jêr kîjan hemû kite ne?**

A)ê, al, zer, reş, rewş, şkeft B)a, la, dewran,deng, serî C)û, rê, mast, kevir, mar D) î, sî, pênc, sed, mêvan

**6-Li jêr kîjan hem kite û peyv in**?

A) al, çêker, teng, tewş B)spî, mî,stran, germ C) sor, derî, nav, av D) mezin, dar,mêw, jîn

**7-Ji peyvên jêr kîjan hemû peyvên hevgirtî ye?**

A)Heval, Sorxwîn B)Dilpak,Tendirûstî

C)Cegerxwîn, Rojbîn D)Binêre, Rojger

**8 - Ji peyvên jêr kîjan dijwateyê hev in?**

A)pîr-kal B)av–bav C)reş-spî D)zarok-malbat

**9-Ji peyvên jêr kîjan hevwateyên hev in?**

A)jor=jêr B)gelemperî=giştî C) kirin=kirîn D) zêr=zîv

**10-Ji peyvên jêr kîjan hemû navdêrên taybet in?**

A)Amed, Pênûs, Adar B)Zîlan, Dîcle, Tîrmeh
D)Viyan, lênûs, Gulan D)Xeyrî, Enzê, Kevir

**11-Ji hevokên jêr kîjan cînavka xwe rast e?**

A)Min xwarin dixwim. B)Ez baş in. C)Hûn çawan in? D)Wan diçe.

**12 – Li jêr kîjan hevok Dema Niha ye?**

A)Min got B)Ez dibêjim
C) Ez wê Bibêjim D) Min gotibû

**13-Li jêr kîjan hevok Dema Borî ye?**

A)Min Pirtûk Xwend B)Wê Pirtûkê Bixwîne.
C) Pirtûk Dixwînim D) Pirtûkê Bixwînin

**14- Ji hevokên jêr kîjan şaş e ?**

A)Navê min Zîlan e. B)Navê wê Sosin e. C)Navê tu çi ye? D)Navê wî Dijwar e

**15-Ji peyvên bin xêzikirî kîjan kirde ye.**

A)Wê mirîşkê xwarin xwar B) Min pirtûk xwend
C) Hacerê dijmin lerizand D) Şoreşgeran li dijmin xistin

**16 - Ji peyvên ku binê wan xêzikirî kîjan lêker e.**

A) Hozan stranan dibêje. B) Delîl çûk firand.
C) Zozan zû hişyar bû. D) Min xwarin xwar.

**17-Ji hevokên jêr kîjan rast e**?

A)Hevala Kajîn baş e.
B)Hevalê Adar jîr e
C)Hevalan me zirek in
D)Hevalên me fêrî zimanê Kurdî dibin.

**18-Ji hevokên jêr kîjan şaş e?**

A)Ez dimeşim. B)Em baş in. C)Tu baş in D)Wî got.

**18-Ji peyvên jêr ên binxîzkîri kîjan nerengdêr e**?

A)Ew mirov baş e? B)Ev rind dimeşe. C)Rindê rind e. D) Viyana rind tê.

**19- Ji peyvên jêr ên binxîzkîri kîjan nehoker e?**

A) Ew gundî xweş ket. B) Çûk bilind firiya. C) Rindê ji gund tê. D) Rizgarê dirêj zû çû.

**20-Ji hovekên jêr kîjan Dema bê ye.**

A) Min nivîsand. B) Ezê bêjim C) Tu bike D)Em jêdikin.

**21-Li jêr çiyayê herî bilind kîjan e?**

A)Agirî B)Cîlo C)Sefîn D)Zagros

**22-Ji kesên jêr kîjan nehelbestvanekî Kurd e ?**

A) Meleyê Cizîrê B)Bêkes C)Cegerxwîn D) Aşik Veysel

**23-Zedetirîn bi kîjan zaravaya Kurdî tê axaftin ?**

A) Kurmanciya Jorîn B)Kurmanciya Jêrîn

C) Dimîlî D)Kelhorî

**24-Rêzkirina bajarên jêr li gorî Bakûr, Rojhilat, Başûr û Başûrê Rojava kîjan şaş e ?**

A)Dêrsim, Mako, Dihok, Qamişlo

B) Batman, Efrîn, Sine, Ranya

C)Ruha, Mahabad, Silêmanî, Dêrik

D)Amed, Ûrmiye, Hewlêr, Kobanê

**25-Li jêr çemê herî dirêj kîjan e?**

A)Mûnzûr B)Zap C)Firat D)Dicle

## EZMÛNA ZIMANÊ KURDÎ-1
## PIRS

1-Rêziman çi ye? Deng çi ye?

2-Tîp çi ye?Tîpên Kurdî çend in? Li gorî rêza wan binivîse.

3-Dengdêr çi ye?Tîpên dengdêr ,dengdêrên dirêj û dengdêrên kin binivîs e.

4-Dengdar çi ye?Tîpên dengdar li gorî rêza wan binivîs e.

5-Pevdenga kurdî binivîs e.Li gorî tîpên dengdêr ku têne rex wê ,ji her yekê mînakekî bide.

6-Tîpên cêwî binivîs e.Ji bo her tîpekê mînakekê bide.

7-Tîpên kelijandinê binivîs e. Ji bo her tîpekê mînakekê bide.

8-Rêpîvanên kelijandinê kengî bin pê dibe?Mînakekî bide.

9-Berî tîpa ”Y” tîpa “Î” nayê eger bê jî bi tîpa “I” tê guhartin. Sedemê vê çi ye? Binivîse.

10-Pênaseya tîpên dubarekirî bide û mînakekî bide.

**Komîteya Ziman û Perwerdeya Kurdî**